Semînera birêz Zeyn-Elabidîn Zinar

Babet/Terîqeta Neqşebendî û şêwandina wê ji layê dewleta Tirk ve

28/11/2006

Babeta axaftina min tenê 6 peyiv in:

Xews, **Hz.Mihdî**, **Seyda**, **Apo**, **Gerîlla**, **Pêşmerge.**

Ez dê li ser van bêjeyan bipeyivim, çendîn ku ev her 6 peyiv naveroka wan pir kûr e bi rastî jî yanî meriv eger ku binvîsîne kitêbeke zêdeyî hezar rûpel jê derdikeve lê belê ji ber ku wext teng e ,wisa bi kurtî min metineke çêkiriye ezê wan ji we re îzah bikim.Çawa ku hun dizanin li Tirkiyê ew herêma ku niha Kurd lê dijîn û ew der weke Bakurê Kurdistanê binav dikin 26 parêzgeh hene, 21 ji wan xurû bi kurmancî dipeyivin, 5 ji wan têkel in kurmancî û zaraveyê Kirdikî(Zazakî)dipeyivin.û her weha Kurd li piraniya herêmên Tirkiyê jî û li gelek bajarên mezin weke bajar Mêrsîn,Edene,Iskenderon,Borse,Istenbol,Enqere,Ental- iya li van deran tev belavbûne, heta hinek dibêjin li Istenbolê jimara Kurdan çendî ku nehatiye çesipandin, lê guman tê kirin ku li dora 6-7milliyon Kurd niha tenê li bajarê Istenbolê dijîn, ji xwe diyar e ku komara Tirkiyê di sala 1923an de hatiye damezirandin, di sala 1926an de jî, zimanê Kurdî û hemû zimanên dî bi qanûneke taybetî hatine qedexekirin, û li kuderê wextê ku Kurdan di wî zemanî de bi Kurdî axivîne wek ceza pere ji wan sitandine.Herweha, di sala 1925an de, hetanî 1938an hertim şer di navbera Kurdên azadîxwaz û artêşa Tirkiyê de domandiye, û piştî ku şervanên azadiya neteweyî Kurd bê mecal mane, dewleta Turk piraniya wargehên Kurdî îmha kirine ,gelek Kurdan ê ko kuştine ê xeniqandine mesele di dadgeha istîqlalê de di yek rûniştinê de îdama 460 kesî ji serkirdarên şoreşa 1925an dane ku piraniya wan şêxên Neqşebendî ne.tevî ku di nava Kurdan de tenê behsa şêx Seîd dikin, şêx Seîd tenê yek ji wan şêxan bûye,lê gelek şêx hatine xeniqandin ji xwe kes behsa wan nake.Di bin wan merc û zordestiyan de êdî ji Kurdan re pir zehmet bûye ku zimanê xwe yê neteweyî biparêzin, jiyana xwe li gor toreya Kurdî bidin domandin, îcar em tev dizanin wextê ku milletek bi zimanê xwe nepeyive û bi toreya xwe hereket neke ,temenê wî milletî 25 sal e ,piştî 25 salan ew millet dimire, diçe.weke nimûne dibêjim vêga ez li Siwêdê dijîm, ev 22-23sal in, eger ez weke xelkê wî welatî bikim tukes wê nizanibe ku ez Kurd im lê wexta ku ez bi zimanê xwe dipeyivim, bi toreya xwe hereket dikim bê ku xelk, bi min re xeber bide jî dizane ez Kurdim anjî xelkê kuderê me. Li Bakurê Kurdistanê 4 saziyên giring hebûne ku Kurdan ji mirinê xilaskirin,ev sazî jî bi piranî li gundan bûne û di gundan de xebatkirine angu ne di bajaran de yek jê medreseyên Kurdî bûne, mesele ez bi xwe gihîştimê hetanî dawiya salên 60 û dawiya salên1975-76an jî, medresyên Kurdî bê kêmasî xebata xwe didomandin, bi dehan kitêbên erebî hebûn ku melayên medresan dersa feqiyên xwe didan wergera Kurdî dikirin, bi kurmancî ji feqiyên xwe re digotin û gelek ji van kilasîkên Kurdî yên kurmancî weke dîwana Melayê Cizîrî û Memûzîna Ehmedê Xanî û gelekên din di dersan de ji feqiyên xwe

re digotin, vî tiştî nehişt ku Kurd bimirin, ya didiwan sazûmana şêxantiyê ne hişt ku Kurd bimirin, mesele bi piranî li Bakur rêçika Neqşebendî xurt e, hemû edab û bingehên terîqeta Neqşebendî bi zimanê Kurdî dihatine kirinê, mesele dema ku şêx di nava mirîdên xwe de digeriya bi piranî helbestên Kurdî digotin, tanî gelek caran ez bi xwe jî şahid bûme ku helbestên Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, yên ji Memûzîna Ehmedê Xanî anjî hindek helbestên Xanî yên din digotin, ya sisiyan eger hindik be jî sazûmana Axatiyê Kurdan parast, weke tê zanîn axa bi du tiştan dibe axa yan mezinê eşîrê anjî xwediyê axê ye, vêce bi piranî li Bakurê Kurdistanê axayên ku hebûn xwediyên axê bûn, ji axê zêdetir xwediyê eşîrê bûn jî .hertişên wan ji ber ku bi Kurdî bû, ji ber hindê tore û zimanê Kurdî jî diparastin,hemû axa weke medrese û tekiyên şêxan wisa xizmeta zimanê Kurdî dikirin lê aliyê nebaş ew tiştekî dinê ye, ya din li Bakurê Kurdistanê, dibêjin dibistana zindî anjî dibistanên zindî ku ew jî çîrokbêj û stranbêj û tiştên wisa bûn,mesele her axayekî çend stranbêbêjên wî hebûn , çîrokbêjên wan hebûn,mesele ez bi xwe zarok bûm tê bîra min5-6 salî bûm meteka bavê min hebû li ba me dima çirayê pêdixist dida destê me digot herin mala apê sofî Misto wê ji we re çîrokan bibêje, îce em diçûn ji me re çîrokên Rustemê Zal û wekî dinê tiştên ecêb digotin, lê belê anuha mixabin tv û net ketine malê, nifşê nû ji van tiştan bê par maye.lêbelê, tirsa dewleta Tirk ji hertiştî zêdetir ji terîqeta Neqşebendiye, çimkî dewletê piştî şoreşa1925an, ya bi serokatiya şêx Seîdê Pîranê ku şêxan dîsa terîqeta xwe da domandin û medreseyên Kurdî bi wasîteya wan xurt û geşbûn, wan dizanibû ku ev tişt di pêşde dîsa wê bibe xetereke mezin ji ber vê yekê çiqas hêza dewletê hebû çû ser şêxên Neqşebendiyan, heta ku min bi xwe jî dîtiye belkî we jî di nivîsan de dîtibe hinek malbatên şêxan hene li bakur dibêjin bi eslê xwe em ne Kurd in, ew têkilî şoreşê nebûne, ewên wisa jî dîsa dewletê wan girt bir sirgûniyê, gelekên wan e girtin xistine hepisan. Anuha ez dê di derheqa van 6 peyivikan de, agahdariyên pir giring bidime we ku hetanî niha kesî behsa wan tiştan nekiriye, nivîskarekî an siyasetmedarekî nenivîsiye û bi devikî jî kesî negotiye, ev tiştê hanê bi rastî ku 30-35sal e ji min re bûye derd, hêvîdar im rewşenbîr û lêkolerên me yê Kurd vî tiştî bikolin. Di dawiya salên 1960î de, dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê terîqeteke Neqşebendî ya sexte derxiste holê, û her piştî wê terîqetê bi kurtedemekê angu piştî ku ev terîqeta sexte li Kurdistanê derxist holê li nav Tirkan jî terîqeteke wisa hate holê, sedem çi bû? Ji ber ku terîqeta xelîfetiya terîqeta Neqşebendî ya ku îro di nav tirkan de heye bi wasîteya Kurdan çêbûye, weke tê zanîn niha li Istenbolê xanedaneke pir mezin heye, bi eslên xwe Tirk in lê xelîfetî ji Kurdan girtine, lê pêşberî doza Kurdî pir rêzdar in, angu Tirk in lê nefreta xwe ji bo Kurdan xasime ji bo Başûrê Kurdistanê ranakin.Di pêşiya salên 1970î de,**Hz.Mihdî** derket, di çiyayê Sasûnê li gundekî Sasûnê, zilamek derket yekî gundî beredayî serserî, navê wî **hecî pîran** bû, bi derbekê bû Hz.Mihdî û bi dehan hezar mirov lê civiyan-di pêş de ezê behs bikim wana çi dikir û çi nedikir-.Di salên1974-75an de ,çapemeniya Tirkiyê ji Abdulah Ocelan ê ko piştre bû serokê Partiya Karkerên Kurdistanê(PKK)gotin Apo, gelo ji ber çi navê wî danîn Apo?ev jî pirseke giring û hêjayî lêkolînê ye.Diyar e ko navê şervanên azadiya neteweya Kurd pêşmerge ye, em tev dizanin di dîrokê de hertim ew kesê ku ji bo rizgarkirina Kurdistanê şer kirine jê re pêşmerge hatiye gotin, lê ji şervanên PKKê re çapemeniya Tirkiyê got gerîlla, gelo çima ev nav li gerîlla kirin, ne

pêşmerge? Di vir de em dê bi kurtî awirekê bidin dîroka neteweya Kurd û sedsala nozdehan û bîstan .Di dawiya sedsala hijdehan de, imperatoriya Osmanî mîrekiyên Kurdistanê ji xwe re bive dîtine û ew yeko yeko ji holê rakirine, piştî ku ew mîrekî rabûne êdî axatiyê angu sazûmana axatiyê xwe di şûna mîrekiyan de kiriye alternatîv û Kurdistanê îdare kiriye, piştî demekê Osmaniyan ew axatî jî bive dîtine û wan axayan yeko yeko ji holê rakirine lêbelê ji ber ku rehên axatiyê di nav axa Kurdistanê de , di nava xelkê de bûne, dewletê nikaribû bi temamî ji holê rabikirana, piştî sistbûn û rabûna axatiyê êdî şêxantiyê xwe kiriye alternatîv û xwe li piraniya herêmên Kurdistanê daye nîşandan,û sazûmana deselatiya xwe parastiye, hemû gelş û nexweşiyên xelkê çareserkirine bi jiyaneke Kurdewarî domandine, ez jî bavê min mela bû, piştre bûbû xelîfeyekî Neqşebendiyan lêbelê terîqetê nedikir, ew mentîqa ku bavê min lê meletî dikir çiqas problem û sergêjiyên xelkê hebûn dihatin ba bavê min, bavê min çareser dikir çi revandina keçan anjî kuştin anjî li ser erdan û heywanan û zeviyan şerkirin, bavê min li gor şerî`etê anjî urfan ew pirsgirêkane çareser dikirin eger ku nikarîbû wana digirt diçûne ba şêxê herêmê da çareser bikin, angu şêxantî sazûmaneke wisa bû hem îdareya dîn û hem îdareya wek dewleteke ne resmî li Bakurê Kurdistanê dikir, yanî wî çaxî hetanî sala 1980 ku cunta eskerî a sisiyan hatiye jî dewleta Tirk nikaribû Bakurê Kurdistanê kontrol bikirana ji ber ku cografiya wê tev çiyayên pir asê ne û di wan şax û newal û geliyên Kurdistanê de gelek gund hene ne rê hebûn ne tiştek anceq ew firokeyên Tirkan karibûn hevûdu bidîtina wekî dinê kesek tinebû, hinek hebûn diçn eskeriyê,hinek hebûn qet nediçûne eskeriyê, lêbelê piştî sala 1980, ew lîderên cunta eskerî emrekî tûj da ku gelek hemû riyên rojhilat çê bibin, piştî ku rê çêbûn êdî elktirîk birine gundan piştî ku elktirîk birine gundan televziyon kete gundan, piştî ku televziyon kete gundan, zilamê parastina Tirkiyê bi navê çerçîtiyê, ew kasêtên video li gundan digerandin ewên asîmilasiyonê bi hêkan roja wê bi hêkekê kirê didane gundiyan îcar hêk jî jixwe zehf bûn, mesele digot heftiyekê li cem we, ew heftî li cem wanaka dima, bi heft hêkan, heft hêkên xwe distand,lê heta mihekê li wir dima ji xwe gundiyan jî mesele fam nedikirin digotin hey me kirêkiriye va ji me re belaş maye, ew kasêta video dubare dikirin heta ku carina diqetiya êdî nema dikaribûn bidine xwediyên wê jî, ji xwe gelek caran ew çerçî êdî şûnde neçûn gundan ew kasêtên video êdî netanîn. Hetanî dawiya salên 1960-î jî, terîqeta Neqşebendî bi temamî herêmên çiyayî yên Kurdistanê di bin kontrola xwe de hiştine lêbelê piştre yeko yeko ewjî êdî jibin vekirine. Li Bakurê Kurdistanê şêxantî nexasime rêçika Neqşebendî tenê bi şêxantiyê jî ranewestaye û dest avêtiye siyasetê jî, heta sala 1925an, li Bakurê Kurdistanê bi serokatiya gorbuhişt şêx Seîdê Pîranê dest bi şerê çekdarî jî kiriye, rêçika Neqşebendî berî şoreşa 25an û piştî wê jî çend şerên din jî lidarxistin lê mixabin bi ser neketin, ji ber hindê komara Tirkiyê şêxê Neqşebendiyan ji bo xwe xetereke mezin dîtiye û ew hemû kuştine yan cezayê hepsê yê pir dirêj daye wan yanjî wana tev sirgûn kiriye, birine welatê herêma behra Êgê, ji xwe wî çaxî li Tirkiyê yek partî hebûye–partiya Etaturk bû, navê wê Cumhuriyet Halk Fuqrasî bû, angu komara xelkên fuqera, piştre bû- Cumhuriyet Halk Partî-lê di salên52-53an de partiya demoqrat kete hilbijartinê bi derbekê qezenckir weke hikûmeta îro ku Teyb Erdogan bi derbekê qezenckir, hikûmet yek para ji partiya xwe çêkir,wî çaxî gelek axa û şêx û maqûlên Kurdan bi wê partiyê de re bûn û zorî dane serokê partiyê, efûya wan mirovên ku biribûne

sirgûnê derxist û ew dîsan vegeriyan hatine Kurdistanê ser gundê xwe man weke axa. Piştî evqasî êdî dewleta Tirk dest bi gelek sînariyoyên pir mezin kir û dek û dolab li serê Kurdan gerandin, bi piranî jî bi navê dîn-olê.Di salên 1960î de, li herêma Xerzan, xortek bi navê Evdilhekîm derket holê, û xwe kir şêxekî Neqşebendî, ev xortê navhatî bavê wî rênceber bû,berê insanên feqîr li ba yên zengîn kar dikirin dibûne rêncber heywanên wan xwedî dikirin, yanî ewî alîfba jî nizanîbû bixwendana, û gelekan dîtine ku bavî wî selikê rîxê ji axuran daye pişta xwe biriye sergo valakiriye ,lêbelê xortê navhatî jinîşkave rabû got ez şêx im, lê tê zanîn ku şêxanî bi xwendinê tenê jî çênabe, tevî ku yekî medresê deh panzdeh salan bixwîne dibe alimekî mezin jî gereke li ba xelîfeyekî îrşadê bike û salên dirêj kar bike eger ku vî xelîfeyî bawerkir ku ew gihîştiye dê xelîfetiyê pê bide û eger negihştibe nade lê xortê navbirî di nav du salan de bû xelîfe, derket holê û îrşad kir,û salek dido têde neçûn, navê wî danîne **Xews**, îcar ev Xews di wê herêmê de ku bi xwe navenda terîqeta Neqşebendî ye belkî Kurdekî tenê jî neçû ba destê wî tobe nekir û nebû murîdê wî, lê bi deh hezaran murîdên wî çêbûn,ku bi tevahî leşker û polîs, memûrên dewletê, bîroqratên bilind weke mudîrên gişti bûn ji Enqere û Istenbolê, li otobosan siwar dibûn diçûne ba wî û gundê wî şîn û ava kirin û zikir û îbadet lê dikirin, biraderekî me sond dixwar digot carekê ez jî çûme wêderê, nav wan murîdan digot ez zikirekî Neqşebendiyan heye wisa egaleke mezin davêjin serê xwe dirahêjin tizbî di binî de silawatan ji xwe re dikşînin, digot min wisa dîqet kir çend heb rûniştîbûn digot yekî kaxiz danîbû ser çokên xwe û qelem derxistibû noteyan dinvîsand di binê wê egalê de, lêbelê xelkê kesî nizanibûn meseleya vî Xewsî çiye.Piştî ku ev şêx derket holê, dewletê dît ku ew nikare di herêmê de mirîdan kom û îrşad bike, qederê sed km ji aliyê rojava de diçe Sasûnê de, êdî yek derket ku navê min Mihdî ye.

Hz.Mihdî:

Mihdî yekî gundî bû, tiştek ji ola îslamê fam nedikir, tenê weke sofiyekî çawa ku diçe mizgevta wextê mele we`zan dikin guhdarî dike tişê wisa gotinên pêxember yên sehabiyan vana ji wan seh dike, Hz.Mihdî jî ilmê wî ev bû, lêbelê zimanekî pir xurt li ser bû angu qabilîyeta ku xelkê iqnah bike pê re hebû,jixwe hun dizanin misilman tevan bawer kirine ku wê ev dinya xirabibe, di dawiya dinyayê de wê Mihdî rabe, wê Hz.Îsa were xwarê, wê Deccal were, insan dê tev bimirin, piştre her yekê dê li ser gora xwe rabe wê rih bikeviyê wê here ber hisabê, û pira selatê heye ku çawa melan dibêjin ji şûr tûjtir e û ji mû ziravtir e, wê xêr û gunihên xelkê terazî bikin, ê ko xêrên wan zehf bin wê ew pira selatê bibe weke isfelteke mezin jê re, ê dinê wê xirabin.Mihdî eynî van tektîkan di serê wan gundiyên çiyayî de anî ji xwe naskirî ye ku ji berêve dibêjin insanê çiyayî ji zanînê dûr in lê qehreman û mêr in, ji wan re digot wê dinya di nêzîk de xirabibe , malê dinyayê dê zererekî mezin bide we, werin malê xwe temam bikin xêr îcar van gundiyan û min bi çavên xwe dîtiye yek hebû mesele3-4 zarokên wî hebûn çêlekek wî a şîr hebû ku mange jê re dibêjin dianî serjêdikir û goştê wê li xelkê belav dikir, mesele yek hebû ku 4 bizinên wî hebûn serjêdikirin, yanî wisa kir ku xelkên deverê heywanek di nav wan de nema , tevan heywanên xwe serjêkirin, êdî Mihdî wexta ku li pêşiya xelkê limêj dikir di mizgevtê de cî tinebû, derdiketine çolê nav zeviyan li erda rast bi hezaran insanê wisa rast dibûn û Mihdî dikete pêşiya wan de limêj dikirin û îrşada xwe bi vî awayî dikirin, vêce ev her roj diçûne gundekî didiwan , wexta ku diçûne gundekî pêşî digotin emê riya gund çê bikin û hêsaniyan da ku xelk destlimêja xwe

bigire û limêja xwe bike, eger ku mizgevt tinebûne wana çêdikir, eger ku hebûna jî xweştir dikirin û hewqas alem li wî gundî bimane dixwarin û vedixwarin digot jixwe dinya beredayî ye ji xwe îro sibe hunê bimirin, radibû van gundiyan heywanên xwe tev serjêdikirin savar û goşt çêdikirin didane wan.Min bi xwe ji çend insanan pirsiye û çend caran ez çûme wê herêmê hindek insan hebûn zana û xwenda bûn û mele jî hebûn min ji wan dipirsî min digot yaw îşaretên qiyametê hene hêjî gelek ji wan mane, meseleya Mihdî wiha ye meseleya Hz.Îsa wiha ye yanî çawa hun bawer dikin ku ew Mihdî ye? Wan ji min re digot:em nikarin bêjin ev ne Mihdî ye jî, û em nikarin bêjin Mihdî ye jî! Wisa Mihdî domand heta sala 1980î dema di 12î Îlonê de cunta eskerî hat ser hukim û ew ji holê rakir. Dema ku komara Tirkiyê bala xwe dayê ku ev şêx Evdilhekîm nikare li wê herêmê terîqeta Neqşebendî ji xwe re biafirîne û mirîdan top bike, dewletê ew ji wir bire bajarê Samsûnê ku jê re bi Tirkî Adiyaman dibêjin û li çolekê jê re gundekî nûjen tevî tekiye û medrese û mizgevt û mêvanxane avakir û bi şev û roj xwarin pijandin û xelkên herêmê tev dihatin feqîr û jar û belengaz ên herêmê dihatin wira xwarin dixwarin, bi sedan û bi hezaran xort diçûne wir dixwendin, vêce di wê herêmê de terîqeta Neqşebendî û ya Qadirî jî nîn in angu şêx li wê deverê nîn bûn, vêce dema ku xelkê ev şêxê nû ê îrşadê didîtin zehf bi ser de diçûn, û zêde mirîd jê re peyde dibûn û vî şêxî îrşada xwe zêde kir berbi rojava ve ji deryaya reş heta derya sipî û Istenbolê angu ew rûyê Andoloya hemû xiste bin kontrola xwe de, îcar her roj deh-bîst otobos tije bi piranî jî berpirsyarê dewletê dihatin ziyareta şêx îce propogandeke wisa belavkiribûn digotin şêxekî pir mezin e û wisa kiriy ew ku ev kafirên dewletê jî jê re mutî bûne, tên li ber destên wî tobe dikin , digot ew şêxê rojhilat mebesta wan şêxên Neqşebendiya bû ne şêx in qabilîtiya wan tuneye ew hiner di wan de tineye ku karibin xelkê îqnah bikin û bi ser xweve bînin. Dekeme kurt li Semsûrê çû kurê şêx jî bû 15-16 salî û jinîşkave ew jî bû şêx û dest bi îrşadê kir du–sê sal şûnde navê vî jî danîn **Seyda**, bavê wî Xews û navê vî jî danîn Seyda , îcer bav û kur her yekî bi aliyekî de îrşadê kirin, û jimareke pir mezin ji mirovan bi ser xweve kişandin û serweteke pir mezin jî kişandin yanî min bi xwe wî gundî nedîtiye mirovên ku çûne digotin qey geraca dewletê ye, pirrî makîne teqsî otobos û tişê wisa ê wana hebûne .Navê gundê şêx Menzîl bû, û vî şêxî anjî vê terîqetê rêxistineke binerd jî çêkir li hindek ciyan nîvsererd-nîvbinerd û navê wê rêçikê jî danîn Menzîl, îro ew Menzîl hêzeke pir xurt ya çekdar e li Kurdistana Tirkiyê, îcer ev jî pêşberî wan insanên ku li gorî wan munafiq in ji rêçika islamê derketine û şêxên xirab in ku bi navê şêxantiyê xirabiyê dikin wan dikujin û ji holê radikin.çendîn ku hin caran ew li pêşberî hikûmetê jî rabûne, lê ji %100 ew jî tektîkeke çimkî wisa nekin ji xwe bi temamî xelk ji wan hew bawer dikin. Çawa ku di ola Xiristiyaniyê de herdem yek heye ku wezîfeya Îsa pêxember dibîne ku jê re Papa tê gotin îro li Vatîkana Îtaliya ye- berê li Istenbol bû piştre çû wê derê- herweha di terîqeta Neqşebendî de jî herdem zatek heye navê wî Xews e angu ew"sereerkanê" terîqetê ye lêbelê ev Xews tukes wî nas nake…kiye? Çi kese? Li kuye? Kes nizane! weke nimûne li tevahiya dinyayê di rêçika Neqşebendî de herdem"Xews"ek heye lê ew Xews li bakur e li başûr e li Indonîziya anjî li Hindistanê ye tukes nizane, belê ew insanê ku kamil nebe ku bi tevahî ne di riya xwedê de be ji xwe di vê rêçika hanê de nabe Xews û wexta ku dibe Xews jî jixwe tukes wî nas nake lê hinek mirovên kamil hene texmîn û guman dikin ku filankes Xews e lê dîsa jî eşkere nikarin bibêjin.Li bakurê

Kurdistanê malbateke Neqşebendiyan heye jê re mala Xews ê Hîzan tê gotin-Hîzan-qezayeke girêdayî parêzgeha Bedlîsê ye li serê çiyayekî pir bilind e, malbateke Neqşebendiya kevnare li wir heye, li gor ku tê gumankirin berî ku terîqeta Neqşebendî bi riya mewlana Xalid li Kurdistanê belav bibe dîsa ew şêx bûne, û malbateke ku pir xelk ji wan hez dikin û bi rastî jî alimên mezin ji wan rabûne û malbateke welatparêz e û serhildanek jî li Bedlîsê kirine, ji wê malbatê re Xews tê gotinê heta niho jî ji wan re dibêjin mala Xews.Vê malbata Xews di sala 1922an de, li bajarê Bedlîsê şoreş kirine û bajar xistine destên xwe de lê mixabin piştre ordiya artêşa Tirk bi hêzeke pir xurt çûye ser wan, piraniya şêxên wan îdamkiriye.Serkêşiya wê şoreşê şêx Şihabedîn û Seyd Elî kirine lêbelê yê ko şoreşê ji aliyê leşkerî ve îdare dikir navê wî mele Selîm bûye ê ko bi eslê xwe ji bajarê Bîngolê ye lêbelê di nava Kurdan de feqe Selîm tê gotin, ev mele Selîm dersdarê medreseya mala Xews bûye .Malbata Seyda jî eve li deşta Mûşê ku ji Bedlîsê mirov diçe Mûşê ku mirov dikeve deştê qederê nîv saetê mirov diçe li milê çepê li quntara çiyê gundek bi navê Norşîn heye, malbata Hezret, anjî mala hezret li wir heye, ewjî malbete pir mezin alimên pir mezin ji wan rabûne, ji ber ku di wê malbatê de bi piranî ew şêxên jê rabûne alim û dersdar bûne di nava Kurdan de ji wan re mala seyda tê gotin. Îcar pilan û projeyên dewleta Turk li ser terîqeta Neqşebendî û bi piranî li ser van herdu malbatan ev bûn ku şêx Evdilhekîm ê ne tutişt bi Xews da naskirin û kurê wî bi Seyda da naskirin ji bo ku meseleya Seyda û Xews di nav Kurdan de problem çêkirin ka gelo wextê bêjijnê Xews, dê bêjin Xewsê Hêzanê ye anjî şêx Evdilhekîm e, wexta ku bêjin Seyda anjî mala Seyda, mala seyda yê hezretê Norşîn e yan kurê şêx Evdilhekîm e?belê probelmeke wiha çêbibû êdî kesî nizanîbû.wextê ku peyivika Xews dihate gotin ji kîjan mlabatê re ji kî re tê gotin. Ji xwe min behsa Mihdî jî kir bê çi tofanek rakir serê Kurdan, ew mentîqeya ku Mihdî jê rabûbû yeka çiyayî ye di navbera herêma jêr û jor anjî di navbera Serhedê û herêma jêr de ciyekî pir stratîcîk e, Kurdên ku li wêderê rûdinin çawa hun jî dizanin malbata Eliyê Ûnis li wir şoreşek kirine, 6-7 salan di wan çiyayan de li berxwe dane milletekî wisa mêranene wisa xurt û bi cesaret in ku hêjî leşkerên Tirk newêre peyatî di wan çiyayan de here , ev Mihdî jî eynî di nava wan gundan de rabû wisakir ku moralên Kurdan ji dinyayê sar bû û bi hemû tiştî dest ji dinyayê berdan, îcer ez bi xwe şahid im şêxekî ji van şêxan rojeke înê li mizgevtê ez çûm nava mizgvetê min dît ku va şêx waz dide, wisa waz dida:xwedê qehr û xezeba xwe li Tirkan bike, wextê wisa got hinekî li dilê min jî xweş hat min got ka wazên şêx bi çi encam bide, digot:dev ji wan berdin gelî misilmanan, em Kurd ehlê cinnetê ne…eskerê me tanqê me tope me tunene ku em zulmê bikin lê ê Tirkan heye, Tirk hêjayî cehenmê ne dê xwedê wan rê bike dojehê ême Kurdan emê tev herine cinnetê, dev ji wan berdin bila dinya jî ji wan re be welat ji wan re be dewlet jî ji wan re be ê me cinnet ji me re ye lê wexta ku şêxek wiha di mizgevtê de bibêje bi rastî jî ew gundî êdî nema hesta millî li rex wan çê dibe. Niha ez ê qala peyivika Apo, pêşmerge û gerîlla bikim.Çawa ku hun jî dizanin di sala 1971ê de, dema ku peymana 11ê Avdarê hatiye ilankirin li başûrê Kurdistanê di navbera serok Barzanî û Sedam Husên de, şahiyeke pir mezin kete Bakurê Kurdistanê, tê bîra min, gundî derketin sîlehan teqandin û li def û zirnê xistin û şahiyên mezin ku heta niha min weke wan nedîtiye rakirin lê belê a dinê rojê angu 12î Avdarê li Tirkiyê artêşê dest danî ser hertiştî, hemû tişt kete bin kontrola dewletê a leşkerî .Ez wê demê li Diyarbekir di

mekteba imam xetîbê de min dixwend sala 3 anjî 4 an bûm, min ji mektebê avêtin, mafê xwendinê ji min sitendin sedem jî ev bû ku min di deftera xwe de peymana 11ê Avdarê bi tîpên erebî nivîsîbû li gor alîfbaya erebî ya berî islamiyetê nivîsa min nuqte nedanîbûn serê, mudûr navê Barzanî jê famkir, pir li min jî dan û ez ji mektebê avêtim, wî çaxî navê me danîbûn komunistên şîn anjî kesk jixwe wê çaxê li Tirkiyê kî bigotana ez Kurd im yan rê ji me re çêkin digotin tu komunistî , êdî komunistan jî kiribûn du beş yên sor û ên kesk vêce yên ku dizanibûn dîndar in anjî limêj dikin anjî zarokên şêx û melan e ji wan re digotin komunistên kesk, û ji yên din re digotin komunistên sor angu dostên Soviyêt. Piştî wê rûdanê Bakurê Kurdistanê dîsa bi temamî kete bin kontrola leşkerên Tirkan û weke ku îro çêkirine, leşkerên xwe bi temam anîn sernaserê sînorên Iraqê ji sînorên Sûriyê heta bighêje sînorên Îranê li wir bi cihkirine, helbet vê tirseke pir mezin xiste dilê Kurdan de bi taybetî Kurdê başûr ji ber deskeftiyên ku li Kurdistanê bi serokatiya kak Mesûd pêkhatî dikevine metirsiyanê de.Li bakur jî istixbaratên Tirkiyê bi awayekî pir xurt xebat kir û Kurdan êdî navê mele Mistefa Barzanî bikar neanî û hemuyan jê re got Apo, xweş tê bîra min di nava bazara Batmanê de em diçûn û dihatin, gazî hev dikirin digo çi xeber ji Apo heye anjî Apo çikiriye, çi nekiriye …herkesî wiha digot û mebesta wan bi gotina Apo, mele Mistefa Barzanî bû. Di salên 1973-74an de, gava ku Abdullah Ocalan ku piştre bû serokê PKK ê derket holê hemû rojnameyên Tirkiyê bi yek zimanî jê re gotin Apo û her wisa gotin heta ku Kurdan bawer kir ku ew Mistefa Barzanî bi xwe ye, angu dema ku li bazarê hinekan basa Apo dikir basa Ocalan dikirin ya bi Kurdî ya bi Tirkî lê xelkê dizanibûn ku basa Mistefa Brazanî dikin di dema ku wan behsa Apoyê ku nû derketibû dikirin.Wê demê Abdullah Ocalan li Enqerê dixwend, dewleta Tirk di wê demê de 3 kes amade kirin di eynî kolîc û zanîneghê de, ew hersê hevalên hev yên heman kolîcê bûn û li Enqerê dixwendin yek Abdullah Ocalan , Hisên Welî Oxlu, û Mihmet Agar.Abdullah Ocalan piştre bû serokê PKKê, Hisên Welî Oxlu bi eslê xwe ji eşîra hafizbinyaye ew hafizbinyaya ku beşek dikeve Torê beşek jî nêzîkî bajarê Bismil e, û Mihemet Agar bi eslê xwe ji Palo ye ciyê şêx Seîdê gorbuhşt Kurdê Zaza ye, Hisên Welî Oxlu bû serokê Hizbollah, ew rêxistina ku dewletê derxist û Mihemet Agar jî bû serokê gişti yê polîsê dewletê piştre bû waliyê awarte yê 26 wîlayetên Kurdistanê. Di salên 1975-76an de, ev rêxistina bi navê PKK ê derket holê û Ocalan jî êdî bi awayekî fermî bû serokê wê.Rêxistina bi navê Hizbollah jî di salên 1978-79an de derket holê û Hisên Welî Oxlu serokê wê li Batmanê rûdinişt, mamostayetiya lîse dikir û ev rêxistin birêve dibir. Milletê Kurd bi piranî Misilman in û mezhebê Kurdan Şafî`î ye, li gor bîr û baweriyên xwe Kurd islama xwe dimeşînin, lê îro li Bakurê Kurdistanê xasime di van demên dawî de, dewlet anuha wisa alîkariya van rêxistinên olî dike û ziyanên wisa dikin weke kuştina melayên Kurdan di mizgevtan de.